# KOMELEY XWÊNDIKARANÎ KURD LE EWRUPA

## (Kurdish Students' Society in Europe)

Azadi u Asiti Bo Kurdistan

Askiraye layi rayigisti cihan u gist dewletan ke geli Kurd le sali 1961 heta em ro le bareki pir naxwêsi u eskenceda eji, hemise ducari kustin u bobmbarankirdin u bendinxanebuwe.
Lem mawe dûr u dirêjeda bi hezaran mindal u pir u jin u law lenawcûn, teha gunahyan eweye ke Kurdbûn. Bebê ewey guhbidrête rayê gisti Cihan u mafimirov u netewayeti Gelan.
Ewey ke tawani Hukumetekani iraqi qurstirkirdiwe heta emro eweye ke dewleti iraq endame li komeli welate yekgirtuwekanda, we hemû ew yasayaney ke peywendiyan be mafi mirov u gelanewe heye le layen dewleti iraqewe pesindkirawin, belam le rastida heta êsta bepêcewaney ew yasayane karkirawe, be taybeti leasti geli Kurda.
Diyartirin belge lem ruwewe berdewambûne le ser siyaseti qelecokirdini geli Kurde.
We le cati pesindkirdini daxwaziye rewakani geli Kurd u Serkirdayeti Sores u hêze dimokrati u pêskewtuwekani kurdistan u gist iraq , ke biritin le westandini ser u destkirdin be gift u gokirdin le gel Serkirdayeti Soresda be amedebûni gist hêz u rêkxirawe pêskewtu dimokratiyekani iraq, bo danani careserkirdineki bineretі ke biritiye le ewtonomi bo Kurdistan u dimokratiyet bo iraq, ebinin Hukumeti emroyiBegdad heta êsta berdewame le ser siyaseti be karhênani hêzi supayi. Sûrbûn le ser em siyasete be pêcewaney pêwisti careserkirdineki asiti xwazaneye. Em siyasetes buwe hoy tazebûnewey ser le Kirdistanda be seweyêki firewan. Kurdistan ducari bombarankirdin botewe be top u firoke u napalm ,be hoy emesewe danistiwani bê tawani Kurdistan ekijrên u dêhatyan esûtinrêt u aware ekrên be sax u eskewtekanda.
Beradeyek leeskewtekanda besyan her le nawcûne be sêweyeki canewertir .
WEK LEM MAWÊYEY DUWAYIDA LE NAWCEY SEXAN RUWIDA BE SUTANDINI SÊST U HEFT (67) MENDAL U JIN BE NEWT LE ESKEWTÊKDA KE PENAYAN BIRDIBUWE BER .

Komeley Xwendekarani Kurd le ewropa lew katedayi Hukumeti Basi iraq tawan bar ekat bew..kirdewe namirovayetiyanew canewerаney pêhelestêt diji geli Kurd u Soresekey. Tewawi pistgiri u tiwanayi terxan ekat bo ser kewtini soresi Kurdistan u hatnedi awate pirizekani geli Kurd.
Le heman katda dawa le rayi gisti cihani u rêkxiraw u dewletekan u komeli welate yekgirtiwekan dikeyn ke bê deng nebêt lew sere cepelew tawananey ke diji geli Kurd peyrew ekrêt le Kurdistani iraq.
pêwist u firmani ser sani hemû RÊKXIRAWE CIHANIW MIROVAYETKAN U DEWLETEKANI EZANIN KE BE TUNDI DAWAYI WESTANDINI SERBIKEN LE KURDISTANI IRAQ DA, HER WEHA DESTKDIN BE GIFT U GOY DEST BECÊ LE GEL SERKIRDAYETI SORES, LE SER BI NAXEY AWTONOMI BO KURDISTAN LE CÊWEY IRAQEKI DIMOKRATIDA.
Care serkirdini kêsey Kurdistan le desti karbedestani hukumeti Begdad daye, we tewai mesulyetyan ekewêt ser san le alozkirdini bari kurdistan u kawilkirdini.

Pistgirtini geli Kurd biritiye le paraztini le qelacokirdin.

SERKEWTIN U SERFIRAZI BO GELI KURD U SORESE QAHREMANEKEY BE SERKIRDA-YETI BARZANI MUSTEFA.

SIKRETARIYETI KOMELEY XWENDEKARANI KURD LE EWROPA

Berlin, 29.11.1969